

WELATIYA/Ê HÊJA,

em di demeke dijwar de derbas dibin, ku ev gelekî ji me nerehet dike: şerê Rûsyayê li Ukrayna, pandemiya korona û encamên wê, guherîna avhewayê, kiriye ku em bi rewşeke taybet rû bi rû bimînin, ku di heman demê de jiyana me jî diguherîne. Pêbawerî û berpirsiyarî di van deman de bi taybetî girîng e.

Weke serokwezîr ez careke din di hilbijartina eyalatê de namzetiya xwe datînim û daxwaza baweriya we û piştgiriya we di hilbijartina eyaletê de dikim. Hevgirêdana kevneşopî û nûjenî, naskirina pirrengiya welatê me yê mezin, xwediliderketina hemû kesan, têgehên me yê bingehîn in ku bi berpirsiyari girêdana me ya bi Saksonyaya Jêrin re diyar dikin.

Bi tecrube û jêhatîbûnê, bi fikrên baş ên ji bo welatê xwe û bi yekityeke xurt em ê bi hevdu re pirsgrîrêkên pêşerojê berteraf bikin û bi ser kevin.

Di 9'ê cotmehê de em baweriya we, ji bo riya ku me ji bo Saksonya Jêrin daye ber xwe û du dangan ji bo SPD dixwazin.

STEPHAN WEIL
SEROKWEZIRÊ WE



WELAT DI DESTÊN BAŞAN DE.

ENERJIYA NÛ JI BO KARÊN NÛ

Heya sala 2040'an em ê hewcêdariya xwe yê enerjîyê 100 % ji çavkaniyên ku dikarin werin nûkirin pêk bînin. Bi avakirineke xurt a enerjîya ba û rojê, em ê ji importkirina enerjîyê rizgar bibin û xwe serbixwe bikin, em ê ekonomiya xwe xurt bikin û cihên karan biafirînin.

RÊZGIRTIN JI BO KAR

Him li cihê avadîyê û him jî li malofîsê: meaşê adilane, şert û mercên xebatê yê maqûl, bihevrebiryardayina jînde. Em ji bo van tiştan in.

PERWERDEYEKE ADILANA Û DÎJÎTAL

Em bi berdewamî veberhênanên xwe dixin xizmeta perwerdehiya zarokên xwe. Ev tê wê wateyê; karkera/ê sêyem tê hêlîna zarokan, em ji hemû zarokên dibistanê re mafê dibistana tevahiya rojê diafirînin û tabletan ji pola 1ê ve pêşkeşî hemû şagirtan dikin.

CÎWARBÛNA ERZAN

Bi şirketeke xaniyan a dewletê re em ê heta sala 2030'î 40 hezar xaniyên nû ava bikin. Bi vî rengî em ê xaniyan dîsa erzan bikin û bi bandor li hember zêdebûna kirêyan bisekinin.

INTERNETA LEZ LI HEMÛ MALAN

Divê heya sala 2025an hemû malên li Saksonya Jêrin bi sîstema tora gigabit ve werin grêdan. Bi vî awayî, em şert û mercên jiyane yê di navbera bajar û welêt wek hev dikin.



TEMAMIYA
BERNAMEYÊ
www.spdnds.de

[facebook.com/Stephan.Weil](https://www.facebook.com/Stephan.Weil)
[instagram.com/stephan.weil.spd](https://www.instagram.com/stephan.weil.spd)
www.stephanweil.de



09 COTMEH 2022
SPD HILBIJÊREBIGUHERÎNE.

SPD
NIEDERSACHSEN